 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

 *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 12

# Çîroka tofanê di navbera efsane û zanistiyê da

## Qonaxên hişyariya mirovî

Mirov dikare sê qonaxan di pêşketina hişyariya mirovî da cuda bike:
- **Qonaxa mîtologiya**: Di vê qonaxê da ji bo her tiştî şîrovekirina efsaneywî serdar bû.
- **Qonaxa ayînî**: Di vê qonaxê da şîrovekirina efsanewî hinekê kêm bû.
- **Qonaxa zanistî**: Di vê qonaxê da şîrovekirina zanistî li ser bingeha aqilmendiyê êdî bû serdar.

Mîtologiya jî bi xwe komek ji efsaneyên ayînî ye ku di civakê da, yan jî di çandekê da, serdare. Mijara wan bi gelemperî li ser afrîner û afrînberan û cîhanê ye, li ser pêkhatina wan û li ser diyardeyên surigtî û her tiştê bi van mijaran ra girêdayî ye wek heyberan û tiştên li pişt suriştê: wek xwedawendan, nîvxwedawendan, cin, perî, îblîs û feriştan[1].

Danasîna mîtologiya bi vî awayî di jêderên pisporî yên xweserî van mijaran da hatiye. Em bawer dikin ku mîtologiya ne hemî ji efsaneyan û çîrokan pêkhatiye, ji ber ku, ji bûyerên wan ra hin bingeh di dîroka mirovatiyê da hene; lê belê ew pir ketine bin guhartin, têfirandinan û mezinkirinan. Ew jî ji ber du sedeman:


**Yekem**: Nizimbûna asta zanînê li ba mirovan di berbanga dîroka mirovayetiyê da. Ew li ber şîrovekirina hin bûyerên suriştî û civakî bê çare diman, axir radibûn hin şîrovekirinên di ser asta rastiyê ra jêra didîtin.

**Duwem**: Di berbanga dîrokê da gengazî û îmkana nivîsandin û tomarkirina bûyeran li ba wan tinebû, û wisa xwe didan ser gotûbêjên devkî. Ji lew ra jî, bi derbasbûna van bûyeran bi awayê devkî, ji nifşekî heya yê din, ev bûyer diketin bin pir guhartinan.

Divêt em bi gelemperî di siya van rastiyan da li mîtologiya gelan û hin bûyerên navdar û girîng di dîrokê da temaşe bikin. Yek ji wan jî bûyera *Tofanê* ye.

## Bûyera Tofanê ji aliyê arkeologî da:

Çîroka *Tofanê* ne bi temamî çîrokeka nîgaşî (xeyalî) ye, û ne jî bi temamî wisa raste. Bingeheka wê ya rastî heye û ev ji aliyê zanistiya nûjen va jî hatiye piştrast kirin. Zanyarê birîtanî yê zanistiya arkeologiyê birêz *Leonard Woolley* bi kolandin û lêgerînê li bajarê "Ûr" yê Somerî di navbera salên 1929 heya 1934-an da rabûbû. Lêgerîn bêhtir di gora padîşahî ya navdar da pêkhatin ku dema wê vedigere ser heyama berbanga senseletên (binmalên) padîşahî. Dema wê heyamê, li gor baweriyên zanyaran yên here nû, di navbera 3500 heya 2800 b.z. da hatiye çespandin[2].


Birêz Leonard li cihê lêgerînê


Birêz Leonard Woolley

Piştî ku birêz *Leonard Woolley* pir çînên bi şopên jiyana mirovî derbas kirin ku stûrbûna wan 11 Pê (3,35 m) ji axa ku di bin avê da niştiye bû û ti tişt ji bermayên mirovî êdî têda tinebûn. Li ser wê çînê û yekser di bin wê çînê ra hin qermîtê şikestî hebû ku vedigere ser heyama pêş dema someriyan. Di pey ra gihîşte qata erdê teze ku şopa ti tiştî têda tineye. Zanyarê arkeologiyê ji rastiya 11 pêyan (dora 3,35 m) ji axa veniştî gihîşte wê encamê ku tofanek li wir pêkhatiye û divêt bilindbûna avê here kêm gihîştibe 25 pêyan (7,62 m)[3].

Birêz *Leonard Woolley* bi ser va zêde dike û dibêje: "**Tofaneka bi bilindbûna avê mîna vê, li welatekî rast û nizim mîna yê Mêzopotamiya jêrîn, divêt firehiya avê li dora 300 mîl dirêj û 100 mîl pehn be. Nexwe, li ber me**

**belgeyeka wisa heye ku tofanek li vir pêkhatiye ya ku di ti deman da di dîroka Mêzopotamiya da pêknehatibû**". *Woolley* bi cegerdariyeka bilind da xuyakirin ku ev tofana li vî welatî hên pêş heyama Someriyan pêkhatiye, ew tofan bi xwe ye, ya ku di pirtûka pîroz ya kevin da (di Tewratê da) jî hatiye gotin[4].

Birêz *Leonard Woolley* dibêje ku ev tofan ne tofaneka cîhanî bûye û seranserê rûyê zemînê negirtiye bin xwe. Ew tenha li herêma deştên nizim yên başûrê Mêzopotamiya pêkhatiye; li cihê ku herdu çemên Dijle û Ferat nêzî hev dibin û ew herêma navbera biyabanê û çiyayên başûrê Kurdistanê ku ji bo jiyana mirov baş bû, xistiye bin avê. Mirovên ku wê hîngê li wir dijyan bawer dikirin ku welatê wan cîhan bi giştî ye[5].

Birêz *Leonard Wooley* berdewm dike û dibêje, belkî dirêjahiya tofanê 400 mîl û firehiya wê jî 100 mîl be; yanê dor 100000 (sedhezar) km çarçîk. Vê tofanê piraniya rûniştivanan daye ber xwe û tenha hejmareka biçûk ji wan mane. Ewên ku zindî mane, bawer kirine ku ev bobelat sezayê xweda ji mirovan ra ji bo gunehên wan bûye. Kesayetiya bi navê "**Ziusudra**" kesek ji ewên ku rizgar bûbûn bû. Ji lew ra jî, ew wek qehremanê *Tofanê* hate hejmartin. Ew bi xwe jî kesayetiya "**Utnapishtim**" di gotûbêja babilî da ye û pêximber *Nûh* di gotûbêja Tewratê da ye[6].

Divêt bê gotin ku seriyê Kendava Somerî (Kendava farisî ya niha) di wan deman da digihîşte nêziya bajarê "Ûr". Yanê dora 60 mîl (96 km) bakurî kenara ava kendavê ya niha[7]. (Li nexşeyê temaşe bike). Ji hêla din va, ji hundirê ava kendavê da jî lehiya avê dihat, yan bi sedema bahozên tund, yan jî bi sedema erdhejên di bin ava deryayê da ku dikare pir herêmên dûr jî têxe bin avê; wek pêlên tsûnamî ku di sala 2011-an da li welatê *Tayland* û derdorên wî pêkhatin. Di heyamên kevin da, çemên Dijle û Ferat jî pir caran bi lehî û lêmiştên mezin dihatin.




Heger me hesabê van hemî rastî û gengaziyan kir, ji me ra tê xuyakirin ku çîroka *Tofanê* bingeheka xwe ya rasteqîn heye. Lê belê, bi şîrovekirina efsanewî, bi rêya gotûbêjên devkî, ji nifşekî heya bi nifşê din, pir li ser hatiye zêdekirin û bûye tofaneka cîhanî giştî.

## Çewtiyeka dîrokî... û sererastkirin:

Birêz *Leonard Woolley* derbarê *Tofanê* dibêje: "**Hatina nûçeya Tofanê di pirtûka pîroz** (Peymana kevin) **da ne tiştekî wisa ye ku mirov lê mat bimîne. Ji ber ku ew dizanin, Îbrahîm ji wir, ji bajarê "Ûr"-a kildanî** (rêwîtiya pêkhatinê, Eshah 11, 31) **û pir gengaze ku wî bi xwe ra ev çîroka Tofanê ya di nav rûniştivanên Mêzopotamiya** (Îraqa niha) **da pir bi nav û deng bû anîbe welatê Ken'an** (Filestîn)[8].

Tiştê ji sedî sed rast ewe ku bajarê "Ûr" bajarekî somerî ye, û dîroka wî vedigere hezarsala sêhem b.z. Lê gotina ku "Ûr" bajarekî kildanî ye, çewtiyeka dîrokî ye ji aliyê nivîskarên Tewratê da. Li ser vê çewtiyê çewtiyeka din jî hatiye avakirin ku pêximber *Îbrahîm* ji Aramiyane, ji ber ku Kildan liqek ji Aramiyane. Lê belê rastî ewe ku di dema *Îbrahîm* da ti Kildan li welatê Somer tinebûn. Piraniya dîroknasan dibêjin ku *Îbrahîm* di sedsala 19-an b.z yan jî sedsala 18-an b.z. da jiyaye. Lê Aramî ji beriya Sûriyayê da, di navbera 1400 heya 1200 b.z. da, ber bi bakur da, ber nawenda welatê Mîttanî (herêma Cizîrê li rojavayê Kurdistanê) çûne, û çûyîna wan ber bi rojhilat da, ber nawenda Îraqê jî di wê demê da ye[9].

Sedema vê çewtiya dîrokî ku nivîskarên Tewratê ketiniyê ewe; ku kelepora olî ya Cihûyan - di pêşî da jî Tewrat - hên ji dema pêximber *Îbrahîm* da bi awayekî devkî ji nifşekî çûye yê din. Nivîsandina wê di sedsala 6-an b.z. da pêkhatiye. Di wê demê da padîşahê kildanî *Neboxez Neser (Buxtnesser)* du caran êriş anî ser Filestînê. Cara yekem di sala 597-an b.z. da û cara duwem di sala 568 b.z. da, dema ku paytext "Ûrşelîm" (Qudis) tar û mar kir û 50000 (pêncî hezar) Cihû awareyî welatê Babil (Îraqa niha) kirin. Li wir aqilmendên *Benî Israîl* dest bi nivîsandina bermaya ayînî ya xwe kirin. Ji ber ku wê demê Kildan li welatê Babil desthilatdar bûn, nivîskarên Cihûyan bajarê "Ûr" yê somerî kirine "Ûr"-a Kildanan[10].

Niha ne cihê wê yekê ye ku em mijara kok û binyata *Îbrahîn* û rêwîtiya wî bigirin ber dest. Ev mijar bi xwe pir tevliheviyên dîrokî têda hene. Belkî em di demên dahatî da lêbikolin.

Tiştê girîng ewe ku çîroka *Tofanê* ya somerî û verziyona babilî ku ji ya somerî hatiye wergirtin, derbasî bermaya Cihçûtiyê bûye û xistine nav wê. Ev tişt yan di dema pêximber *Îbrahîm* da pêkhatiye yan jî - ya here gengaz ewe - ku di dema awarekirina Cihûyan da bo welatê Babil, mebesta me sedsala 6-an b.z. ye, ku wê hîngê çîroka *Tofanê* bûbe beşek ji bermaya kirîstiyanî û di pey ra ji ya îslamî jî.

Çarşembe, 17.06.2015

## **Jêder:**

1 Taha Baqir: Pêşgotinek di dîroka şaristaniyên kevin da, rûpel 262.
2 Taha Baqir: Pêşgotinek di dîroka şaristaniyên kevin da, rûpel 262
3 Georg Ro: Îraqa kevin, rûpel 161.
4 Georg Ro: Îraqa kevin, rûpel 161-162.
5 Muhemmed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 68.
6 Muhemmed Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 68
7 William langer: Berfirehiya dîroka cîhanê, 1/52.
8 Georg Ro: Îraqa kevin, rûpel 162.
9 William langer: Berfirehiya dîroka cîhanê, 1/78-79. Ebdulhamid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 342. Seyed El-Qimni: Pêximber Mûsa û rojên dawî yên Til Amarna, C1, rûpel 347.
10 Thomas Li. Thomsen: Dîroka kevin ya gelî îsraîlî, r A. Jean Bottéro û yên din: Rojhilata Nêzîk û Şaristaniyên destpêkî, rûpel 21, nîşe, 1. Fadil Ebdulwahid Eli: Ji Somer heya Tewrat, rûpel 191.